

Mukaddime, 2018, 9(1), 133-150
DOI: 10.19059/mukaddime.350637

Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê

Zülküf Ergün*

Kurte: Ev gotar di mînaka şeş berheman de taybetmendiyên xeta giştî ya vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê vedikole û bi taybetî bal dikêşe ser mijarên gotara vegêr û taybetmendiyên cih û karakteran. Nivîskarên kurd ên li Sovyetê wek nûnerên komeke etnîk a paşdemayî dema bi saya derfetên çandî yên Sovyetê dest bi berhemanîna edebiyateke nivîskî dikin bi xurtî dikevin bin karîgeriya vegêrana folklorîk û rêbaza realizma sosyalîst û di bin karîgeriya van hokaran de berhemên hevşêwe diafirînin. Ji ber vê jî di berhemên xwe de wek tîpolojîya vegêranê hertim vegêrê xwedayî, wek cihê qewimîna rûdanan gundan û di afirandina karakteran de jî karakterên yekalî û neguher tercîh dikin. Ev rewş nîşan dide ku vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê bi taybetmendiyên xwe yên folklorîk û îdeolojîk xwedî dîmeneke yekreng û dengekî monolojîk e.

Bêjeyên Sereke: Vegêran, vegêr, cih, karakter, edebiyata kurdî ya Sovyetê

133



Sovyet Kürt Edebiyatı Anlatısının Özellikleri

Öz: Bu makale altı eser örneğinde Sovyet Kürt edebiyatının ana hattını oluşturan anlatının özelliklerini incelemekte ve özellikle anlatıcının söylemi, mekan ve karakter özellikleri konularına dikkat çekmektedir. Sovyet Kürt yazarları, gerikalmış etnik bir grubun temsilcileri olarak Sovyetler Birliğinin kültürel imkanları sayesinde yazılı edebiyat üretimine başladıklarında, güçlü bir şekilde folklorik anlatı ve toplumcu gerçekçi yöntemin etkisi altına girer ve bu faktörlerin etkisi altında birbirine benzeyen eserler üretirler. Bundan dolayı eserlerinde anlatı tipolojisi olarak her zaman ilahi anlatıcıyı, mekan olarak köyleri ve karakterizasyon olarak da tek yönlü ve değişmeyen karakterleri tercih ederler. Bu durum Sovyet Kürt anlatısının folklorik ve ideolojik özellikleri ile tek renkli bir görünüme ve monolojik bir sese sahip olduğunu göstermektedir.

Anahtar Sözcükler: Anlatı, anlatıcı, mekan, karakter, Sovyet Kürt Edebiyatı

*Öğr. Gör. Dr. Mardin Artuklu Üniversitesi, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, zzweshevi@gmail.com

The Characteristics of The Soviet Kurdish Literature Narrative

Abstract: This article examines the characteristics of the narrative that constitutes the main line of Soviet Kurdish literature in the case of six works and particularly draws attention to the narrative, setting and discourse of narrator. When Soviet Kurdish writers, as representatives of a backward ethnic society started to produce written literature through the cultural opportunities of the Soviet Union, the folkloric narrative and the socialist realistic method strongly influenced them, and they produced works that resembled each other under the influence of these factors. Therefore, they always chose divine narrator as the typology of narrative in their works, the village as the setting, and the unique and unchanging characters as the characterization. This shows that the Soviet Kurdish narrative, with its folkloric and ideological features, has a monochrome appearance and a monologic voice.

Key Words: Narrative, narrator, setting, character, Soviet Kurdish Literature

Destpêk

Reha vegêrannasiyê (narratology) bigihîje heta Platon û Arîstoteles jî, mijarên ku peywendiya wan bi vegêranê (narrative) re hene bêtir ji aliya formalîstên rûsî û binyadgerên fransî ve tîen gengeşekirin. Ji ber vê bi jimareya taybet a kovara *Communicationsê* ya fransî (1966) vegêrannasî di navendên edebî de wek dîsîplîneke serbixwe tê pejirandin (Jahn, 2012: 43) û dibe rêbazê vekolîna deqên edebî. Vegêran bi giştî amaje bi ragihandina kirdara vegevanê û gotara zarekî û nivîskî bike jî di berhemên edebî de nûnertiya vegêrana rûdanek yan jî zincîreya rûdanan dike (Genette, 2011: 13) û bi rêkûpêkirina keresteyên ciyawaz wate dide elementên nav berhemê. Dema weha be destnîşankirina taybetiyên vegêrana berhemekê tevî binyad û formê taybetiyên wateyî yê wê berhemê jî derdixê holê.

Herçend binyadger taybetiyên binyadî û naverokî yê berhemên wek regezên pevgirêdayî bibînin jî berhemê ji karîgeriyên derekî dadibirin û wek yekeye serbixwe pê re serederî dikin, lê li ser rêçika paşbinyadgerî û rexneya dîrokî ya nû em di wê baweriyê de ne ku taybetiyên vegêranî yê berhemên edebî di nav tora peywendiyên civakî, siyasî û çandî de peyda dibin û bi hokarên derekî re di nav tîkiliyêke bihêz de ne. Jixwe Onega û Landa jî di wê baweriyê de ne ku vegêrannasiya pratîk herçend wek nêrîneke navxweyî ya berhemê bê dîtin jî di rastiyê de peywendiyêke wê ya bihêz bi dîrok, binyadên civakî, dezgeh û diyardeyên çandî re heye (Onega-Landa, 2002: 51).

Li ser vê bingehe bi dîtina me, taybetmendiyên vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê jî di nav mercên taybet ên civaka kurdên êzîdî û Yekîtiya Sovyetê de derdikeve holê û di bin karîgeriya van mercan de teşe digire. Hêjayê gotinê ye civaka kurdên êzîdî dema di encama şerên navbera Osmanî û Rûsyayê de xwe li Rûsyayê digirin ji bilî folklorê xwedî tu sermiyan û nerîteke edebî nînin. Loma jî gava bi saya derfetên çandî yê Sovyetê dest bi dahênana edebiyateke nivîskî

dikin tevî paşxaneyê xwe ya dîrokî û folklorîk bi xurtî dikevin bin karîgeriya rêbaza realîzma sosyalîst a Sovyetê û vegêrana wan di bin sîbera van hokaran de teşe digire.

Bêguman ev hokarên navborî dibin sedem ku di edebiyata kurdî ya Sovyetê de vegêraneke hevşêwe derkeve holê ku gelek caran mirov nikare vegêrana nivîskarekî ji nivîskarekî din cuda bike. Ev diyarde di berhemên qonaxa yekem de bi zeqî li ber çavan bikeve jî wek nerîteke berdewam di piraniya berhemên qonaxa dawî de jî tê dîtin. Tevî vê yekê, mirov nikare hemû berhemên vê edebiyatê bixe nav vê kategoriyê. Bi taybetî hin berhemên ku piştî salên heftêyî tîn nivîsîn xwedî taybetmendiyên xweser in û divê cuda bînin nixandî.

Di vê gotarê de ji bo diyarkirina xeta giştî ya vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê ji şeş nivîskarên cuda çar roman, novellayek û çîrokeke dirêj hatine hilbijartin û hemû jî berhemên qonaxa dawî ya vê edebiyatê ne. Romana *Jiyana Bextewar* a Erebe Şemo cara pêşî di 1959an de, romana *Hewarîyê* ya Heciyê Cindî di 1967an de, romana *Kurdê Rêwîya Sehîdê Îbo* di 1979an de, romana *Dê û Dêmarî* ya Egîdê Xudo di 1986an de, novellaya *Morofê* ya Eliyê Evdilrehman di 1957an de û çîroka *Xezalê* ya Sîma Semendê jî di 1961an de hatine weşandin. Di vê gotarê de di mînakê van berhemên navborî de em dê taybetmendiyên vegêr, vegêran, cih û karakterên vê edebiyatê binirxînin û xalên hevbeş ên van berhemên berçav bikin. Ji ber ku zincîreyê rûdanê ya van berhemên mijara gotareke serbixwe ye, em dê di vê gotarê de behsa vê mijarê nekin.

1. Vegêr û Vegêran

Ciyakirina nivîskar û vegêr (narrator) yek ji xalên bingehîn ên vegêrannasiyê ye ku nivîskar li derveyê cîhana vêkxistî (fictive) tê hiştin û vegêr jî beşek ji cîhana vêkxistî tê jimartin (Dervişcemaloğlu, 2014: 116). Bêguman ev diyarde bi cextkirina vêkxistina berhema edebî re bêtir derdikeve holê û cihgîr dibe, lê di romanên pêşî yê edebiyata kurdî ya Sovyetê de ji ber karîgeriya bihêz a vegêrana folklorîk nivîskar carinan di rola çîrokbêj de erka vegêranê digirin ser xwe û xweseriya gotara vegêr bînpê dikin. Di vê rewşê de nivîskar û vegêr dibin yek û ciyawazî di navbera wan de namîne. Bêguman ev diyardeya ku di romanên otobiyografîk de taybetiyeke cureyî ye di romanên din de wek kêmasiyeke vegêrana modern tê pejirandin.

Tevlihevkirina gotara nivîskar û vegêr herî zêde di *Jiyana Bextewar* a Erebe Şemo de tê dîtin û di romanê de gelek caran nivîskar di rola vegêr de derdikeve pêşîya me. Bo nimûne di romanê de dema vegêrê romanê ji rûdana navendî ya romanê vediqete û behsa hebûna îngilîzan dike li Gurcistanê, bang li xwendevanan dike û dibêje: “Ez ji xwendevanên xwe îtimaz dikim. Ez ê çend gilîyan ji emrîjîna Îngilîz ku berî hatina eskerên sor li Gurcistanê binivîsim” (Şemo, 2015: 203). Herweha dema wek mînakeke serkeftî ya xwendayên kurdan behsa Sehîd dike, careke din yekbûna nivîskar û vegêr dupat dike: “Ev gilîyên der heqa Sehîdê tamam nabe, wekî ez der heqa Sehîdê hînbûna wî nenivîsim” (r. 222).

Herwek tê zanîn, nivîsîn karê nivîskar e, ne karê vegêr, eger li ser zimanê vegêr behsa nivîsînê bê kirin wê demê ciyawaziya gotara nivîskar û vegêr ji holê radibe. Erebe Şemo ji ber ku xweseriya vegêr li ber çavan nagire di romana xwe ya navborî de gelek caran bang li xwendevanan dike û rasterast xwe dike muxatebê wan:

Xwendevan êdî zanin, çima Ebdilmecît li vê derê; li bindarûkê ji xortên Sîpkan re digot: Kurap (r. 16).

Xwendevanêd delal, ew Xezala ku wextekê çûbû bindarûkê, êdî mezin bûbû (r.28).

Gerek e em çend gilîyan bibêjin der heqa Mîrza Beg, wekî xwendevanên ezîz zanibin kî ye ev beg? (r. 53).

Xwendevanêd delal, bi rastî jî Xwedêda hêjayî wan pesinan bû (r. 83).

Xwendevanêd ezîz, di vê kaxiza Vrasîyan de em dibînin, wekî partîya Daşnakan ji Roma zilmkar re lava dike (r. 180).

Ev mînakên banga li xwendevanan di romana *Jiyana Bextewar* de nîşaneyên wê yekê ye ku vegêran rasterast li ser navê nivîskar tê pêkanîn û hebûna vegêr li ber çavan nayê girtin.

136

Di romana *Hewarîyê* ya Heciyê Cindî de jî em rastî heman diyardeyê tên. Di para yekem a romanê de taybetiyên vegêr heman taybetiyên Heciyê Cindî yê folklorîst in ku di nav gundên kurdan de digere û derbarê serpêhatiyên wan ên berê de agahiyên berhev dike. Di destpêka para duyem a romanê de vegêr jî gundê Kûrekendê vedigere û herwekî Heciyê Cindî di mala xwe ya Erîvanê de dest davêje qelemê û diyar dike ku dê çîroka êlê binivîse:

“Dima min qelem hilda, bi fikir û xeyalên xwe re bigihîştama û li ser kaxizê li pey hev du ro bikira. Belê, belê, ez ji xwe û dilê xwe re dibêjim, riyeke dirêj ketiye pêşiya min, ka em lê binihêrin êl çawa bû, ka êl ê îcar bi kû de bar bike?” (Cindî, 2008: 195).

Bi vî awayî nivîskar diyar dike ku rûdanên ku bingeha romanê pêk tînin dê ji aliyê wî ve bînin nivîsîn û kesê ku bi karê vegêranê radibe ew bixwe ye. Loma jî di “Paşgotina” a romanê de careke din em dengê nivîskar dibihîzin ku romanê wek bîranînên xwe yên kesî û eşîrî dide zanîn û xwe dike çavkaniya vegêranê: “Îro çil û pênc saliya Rêspûblîka Ermenistana Sovyetiyê ya Sosyalîstiyê ye, rojê xweş, bi nav û nîşan. Bîranînên min ên berê bûne xewnerojk, de bila herin, qe venegerin” (r. 401).

Şehîdê Îbo jî di romana xwe ya *Kurdê Rêwî* de di destpêka romanê de diyar dike ku dê behsa koça êla Ortila bike ku berê li pişta Çiyayê Girîdaxê bûne, paşê hatine Surmeliyê û di 1920î de jî dema alaya Şoreşa Bolşevîk hatiye hildan digel ermeniyên xwe li Sovyetê girtine. Nivîskarê ku dibêje “ez ewledê êla Ortila me”

bi vê romanê dixwaze serpêhatiya êla xwe veguhêze û di serê romanê de erka vegêranê digire ser xwe:

“Roja îro dilê min mîna çemekî kefgurî, ku sîngê Elegezê da dadibire rabûye. Bes e, îdî sebar bêfeyde ye. Gerek e teslîmî kaxezê bikim, wan nêt û merema, ê ku eva bîst sal e dilê min dikojin...wekî ewledekî êla Ortila terka firotina qatix daye, îro derheqa hal û wextê pêşê xwe da dinvîse. Awqas... Em dest pê bikin” (r. 16).

Bi van gotinan Sehîdê Îbo jî mîna Erebe Şemo û Heciyê Cindî behsa nivîsîna serpêhatiya êla xwe dike ku ji bîranînên wî yên bîst salî pêk tên û ew jî nivîsîn û vegêranê wek hev dibîne.

Ev şêwaza nivîskarên navborî ji bilî pêşneketina têgihîştina wan a vêkxistinê, di heman demê de nîşaneyê karîgeriya vegêrana folklorîk e li ser wan. Lewra kurdên êzîdî cara yekem bi saya Sovyetê dest bi xwendin û nivîsînê dikin û heta radeyeke baş vegêrana wan xwe dispêre çîrokbêjiya folklorîk. Ji ber vê ev nivîskar xwe dikin şûna çîrokbêjên nerîtî û erka vegêrana çîrokê digirin ser xwe, lê ciyawaziya wan ji çîrokbêj di kiryara “nivîsîn”ê de ye, loma jî di şûna “gotinbêjî”yê de behsa nivîsînê dikin û bê bikaranîna navberkarekî xwe dikin muxatebê xwendevanan. Bi vî awayî ev nivîskar bê ku xweseriya vegêrê vegêrana modern li ber çavan bigirin erka çîrokbêjê vegêrana nerîtî digirin ser xwe û rasterast bi xwendevanan re dikevin diyalogê. Loma jî di vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê de ji aliyê ziman û şêwaza vegêranê ve gelek çaran em rastî şêwaza çîrokbêjiya nerîtî tên. Bo nimûne di *Jiyana Bextewar* de dema derbarê Zînê de agahî tên dayin vegêr bi şêwaza çîrokbêj weha dibêje: “Bila Zînê bi vê riyê de ber bi gund here, em destûrê bidin xwe, ji xwendevanên xwe yên ezîz re gilî bikin ka Zînê kî ye, keça kê ye, ev agronoma cahil bi çi tehrî li van deran peyda bûye” (r. 90). Herweha di heman romanê de dema Emerîk bi birîndarî dikeve destê Romê û amadekariya revê dike dîsa vegêr wek çîrokbêj dibêje: “Bila Emerîk ji wê derê bireve, lê em binêrin di çi halî de bû, kulfetên wî” (r. 162).

Tevî ku di hin deqan de gotara nivîskar, vegêr û çîrokbêj tê têkelkirin jî di vegêrana deqên edebiyata kurdî ya Sovyetê de ji bilî çend awarteyan bi giştî vegêrê xwedayî tê bikaranîn. Bêguman ev, tercîheke mebestdar e ku peywendiya wê bi taybetiyên vegêrê xwedayî, vegêrana folklorîk û armanc û naveroka edebiyata kurdî ya Sovyetê re heye. Lewra taybetiya diyar a vegêrê xwedayî ew e ku gotara wî gelek dişibe gotara nivîskar û çîrokbêj; destwerdanê di rûdanê dike, derbarê kes û karakteran de şîroveyan dike û bi agahî û çavdêriyên xwe dibê berdevkekî dilsoz ê nivîskar (Stanzel, 1997: 19). Ji aliyê din ve, ev vegêr ji ber ku hakimê her tiştî ye wek vegêrekî bawerpêkirî jî tê zanîn (Wood, 2010: 18). Ev taybetmendî jî ji bo alîgiriya rêbaza realîzma sosyalîst a edebiyata kurdî ya Sovyetê û pêgîrbûna wê ya îdeolojîk tiştêkî guncaw e û nivîskar bi rêya vegêrekî weha bi hêsanî dikare xwendevan araste bike û wî li gor armancên xwe yên îdeolojîk manipule bike. Lewra ev vegêr bi gotina Stanzel rê û awayê nêzîkbûna xwendevan ji bo mijarê diyar dike (Stanzel, 1997: 21) û dixwaze bi her awayî rêbertiya wî bike.

Ev jî derfeteke weha dide nivîskarê pêgîr ku bi rêya vegêrê xwedayî derbarê kes û rûdanên berhema edebî de şîrove û helwestên xwe diyar bike û li gor armançên xwe yê îdeolojîk xwendevanan araste bike.

Di romana *Jiyana Bextewar* de vegêrê xwedayî dema behsa serboriya kurmançên hejar, beg û dîwana Romê dike bi jargona îdeolojîk a nivîskar berê xwe dide rûdanê û bi şîroveyên siyasî xwendevanan araste dike. Ev jî taybetmendiyeke tîpîk a vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê ye ku di deqên gelek nivîskaran de derdikeve pêşiya me: “Bi rastî jî Dîwana Romê û bi begên Kurmançan re êdî taba Kurmançên zehmetkêş biribûn. Li aliyekî Romê ji Kurmançan distand, xerc, xerac, bertîl, rişwet, pêşkêş, li aliyekî jî began mexlûqet dişêland, tu mecala Kurmançan di destê wan de tune bû” (r. 22). Wek taybetmendiya vegêrê xwedayî di vê romanê de jî vegêr piştî veguhestina hin rûdanan dikeve navberê û şîroveyên xwe bi xwendevanan re parve dike: “A bi vî teherî padşayê Romê bi destê casûsên xwe, bi destê bêbext û xayînên mîna Teyo Beg, eşîr û êlên Kurmançan berî hev didan” (r. 154).

Roman ji ber ku li ser dijayetiya neyarên Sovyetê û pesindana sîstema siyasî ya Sovyetê hatiye nivîsîn vegêr gelek caran li ser hesabê nivîskar helwesta xwe ya siyasî aşkera dike:

“Xwendevanêd ezîz, di vê kaxiza Vrasîya de em dibînin, wekî partîya Daşnakan ji Roma zilmkar re lava dike, destê wan hê ji xwîna gundîyên Ermenî û Kurd ziwa nebûne. Cîyê bilasebep û bêguneh kal, pîr, jin û zar hatine qirkirin” (r. 180).

“Ew meremê ku Sehîd li ser bû, şev û roj li ser difikirî, lê ew çend sal bûn nedihat serî, îcar hat serî. Wî jî her bi saya Lenîn û bi saya Partîya Bolşevîkan. Ew partiya ku rê û hemû derge vekirin û ji hemû zehmetkêşan re” (r. 208).

Heciyê Cindî di para duyem a *Hewarîyê* de dema bi vegêrana xwedayî behsa Fêrîkê lehengê romanê dike di çarçoveya îdealîzekerina tîpê erênî yê şoreşgêr de di hizir û hişê hevalên wî de pesnê Fêrîk dide: “Ka çi çaxê teyrê atmece yê vegere, bê giliyên teze bibêje, wan hîn bike amade bike ji bo rojên ku tîn” (r. 363). Vegêr dema behsa taybetiyên Fêrîk û şiyana wî ya propagandayê dike alîgiriya xwe aşkeratir dike:

“Xeberdana wî wisa xweş bû, wisa dil bi dil, wekî mirov bixwesta nexwesta wê guhdariya wî bikira û her xeberek bikira nava dil û hinavê xwe. Xeberên wî mirov germ dikirin, şa dikirin, guman dida ber dilên wan û ji guhdaran tirê ev e, wekî destên xwe dirêj bikin, bi wê bextewariyê bigirin, hembêz bikin, ewa ku dê û bavên wan, pêşiyên wan ew qas lê digeriyan” (r. 364).

Piştî vê pesindanê vegêr careke din berê xwendevanan dide ser hişê hevalên wî û karîgeriya axaftina Fêrîk ji bo wan radigihîne: “Xeberdana wî lawikê

tevî hevdu bîst salî, aqil ji serê mirov dibirin, xew ji çavên wan revandibûn, û te digot, gîşan dengê bilûrekê wê nivê şevê dibihîst, dengêkî wisa xweş dibihîst, wekî mirov ji xwe ve diçû, serxweş dibû, lê tima dima” (r. 365).

Vegêrê xwedayî ne tenê hest û hizrên karakteran vediguhêze, carinan dikeve nav diyaloga wan û helwesta xwe rasterast nîşan dide. Bêguman ev taybetiyeke tîpîk a vegêrê xwedayî ye ku wî ji vegêrên din cîya dike:

“Lênîn, Partiya Komûnîstiyê xeberine teze bûn ji bo hinek van xelqê çiya. Lê her du jî wisa hatine gotin, wekî te hew dizanibû ew li hêviya wan navan bûn, li hêviya hatina wan, lewma jî, ew her du navên ezîz di dilê her yekî wan de rûniştin, wekî tu caran neyêne jîbîrkirin” (r. 367).

Nivîskar bi van gotinên alîgir ên vegêrê xwedayî piştgiriya gotara îdeolojîk a karakterê romanê dike û di îqnakirina xwendevanan de wek vegêrekî bawerpêkirî roleke çalاک digêre.

Di *Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo* de jî vegêrê xwedayî wek alîgirê Sovyetê rûdanan şîrove dike û rengê xwe yê îdeolojîk diyar dike:

“Gundî guhê gê da razayî nîn bûn. Wexta beyraqa Oktiyabrê e sor e, gevez li Ûrisatê dimilmilî, wexta dengê topa Avrorayê li ber zangê Sînekê ye pîr ketibûn, sava mirinê li dil û hinavê Karapêt da hêlîn danîbû, ew hal û meş dikir” (r. 120).

“Qewimandinê gundê Karapêt axa, bîna bayê azabûnê, şemala roja Oktiyabrê ye ‘emiranî bi saya xevata Ûmnov, Sûrênê ermenî, Zûrbe, Sebrî û Ûsiv gihîştibûne evî gundê kurmançiya yî undabûyî jî, ruh û qinyat dabû bineliyê vir jî” (r. 170).

Di *Morofa Eliyê Evdilrehman* de vegêrê xwedayî bi gotinên subjektîf û pesindariyê behsa Lenîn û Şoreşa Bolşevîk dike û raya xwe ji xwendevanan re aşkera dike:

“Partiya Komûnîst bi serkariya Lenînê mezin serkarî li şerkariya sinifa pale û gundiyên xebatkar dikir û di Oktyabra sala 1917’an de, li Ûrisetê hukimeta kapîtalîstan û milkedaran hate walgerandin, li dewsê Hukimeta Xebatkaran a Sovyetiyê hate sazîkirin, ku di temamiya rûbarê dinyayê de ya sinifa pale û gundiyên xebatkar dihate hesabîkirin” (r. 74).

Di vê berhemê de wek taybetiya vegêrê xwedayî vegêr tiştên ku di hizrên karakteran re jî derbas dibe dixwîne û ji xwendevanan re vediguhêze:

“Morof çaxê di dilê xwe de gotê, “Bi serê te, giliyên te mîna stûyê deveyê rast in. Dêrd û kulên min kuta bûne, îcar ez bi şuxulê te re gerek mijûl bûma erê? Weleh heta ji min bê, ez dê miqabilî te derêm û serê her gavekê ziyar bidime te û dewleta te. Eger ji destê min bê,

çawa ku te xwîna van feqîr û fiqareyan mêteye, ez ê jî xwîna te bimijim, hela dîsa dilê min wê hêsa nebe” (r. 48).

Di *Xezala Sîma Semendê û Dê û Dêmarîya Egîtê Xudo* de ji berhemên din cudatir vegêrê xwedayî bêalîtir e û ji bilî çend mînakên biçûk mirov rastî aşkerakirina niyet û afgîriya vegêr nabe. Di van her du berheman de nivîskar vê rolê didin ser milên karakteran, loma jî pêgîriya realîzma sosyalîst di van berheman de di axaftin û diyalogên karakteran de derdikeve holê. Di *Xezala Sîma Semendê* de dema Xezal naxwaze bi Qaçax re bizewice û biryar dide ku bibe doktor, diya Xezalê zewacên bizerê yên serdema berê bi bîr tîne û pesnê azadiya welatê Sovyetê dide:

“Qîza min, gelek baş e, bi rastî tu tiştêkî pîrr pak fikirîyî. Lawo, hûn çiqas bextewar in. Hûn di welatekî weha azad da dijîn! Di orta mêr û jinan da ferq tune. Lê qîza min berê... Tiştêkî eyb bû ku qîz di derheqa xwendinê da bifikiriyana. Hema belengazan hinekî çavên xwe vebikirana, ji dinê fêm bikirana, hema ew didane mêr... Ew ne mêrkirin bû, weleh hema hema ew difirotin... Aha lawo, heyata me ya berê ev bû. Hûn bextewar in, hûn bextewar in, hûn di vî welatê azad da dijîn” (r. 9).

Li beramber van gotinan, Xezal jî di çarçoveya pêgîriya realîzma sosyalîst de pesnê Lenîn û Partiya Komunîst dide û wek tîpeke erênî ya xebathez peymanî wê yekê dide ku dê baş bixebite û di binecîhkirina komunîzmê de beşdarî bike:

“Erê dayê, ez razî me, ez ji jiyana xwe zaf razî me. Ji bo vê yekê em deyndarê Lenînê mezin û Partiya Komunîst in. Gereke em ji bo xebatê qeweta xwe nehêvşînin. Divê em rind bixebitin, ku di vî welatê xwe yê serbest da komunîzmê çekin” (r. 9).

Di *Dê û Dêmarîyê* de jî ji ber ku gelek caran behsa “Şerê Wetenî”yê yanî Cenga Cîhanê ya Duyem tê kirin li ser zimanê karakterên romanê misêwa dijayetiya Hîtler tê kirin. Ji ber vê, Evdokîya dema behsa bobelatên şer û biryara xwe ya beşdarbûna şer dike herwek angajmana realîzma sosyalîst derbarê Hîtler de dibêje: “Hîtlerê merîxur nehîşt em bi mirazê xwe şa bibin” (Xudo, 1995: 7). Herweha dema Karê ji bo mirîna Cemalê dergistiyê xwe dil dide Seyrana diya wî, Hîtler tawanbar dike û nîfiran lê dike: “Mala Hîtler wêran bibe, çawa warê me sar kir, mirazê ciwanan di çavan de hîşt” (r. 19). Bi vî awayî di gelek cihên romanê de li ser zimanê karakterên romanê dijayetiya Hîtler û şerfiroşîya wî tê kirin û di vî şerî de piştgîriya pêgeh û helwesta Sovyetê tê kirin. Heman alîgirî di dijayetiya adetên kevin de jî tê kirin ku li pêşîya “jiyana teze” ya sîstema Sovyetê asteng in. Dema di bin karîgeriya Şêx Sefo de bavê Sîsê naxwaze keça xwe bide Saşa, Reşîd û Evêlîna Rubênovnaya wek nûnerên îdeolojiya Sovyetê bi axaftinên xwe vê meseleyê çareser dikin û pêşî li fitneya Şêx Sefo digirin.

Bi van mînakên jorîn ji bo me ron dibe ku ji ber angajmana wê ya îdeolojîk û taybetiya wê ya folklorîk di vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê de nivîskar,

vegêrê xwedayî û karakter wek sê ragihînerên cîyawaz di her sê astan de jî bi yek riwangeh û yek dengî beşdarî kiryara vegêranê dibin û dengê zal ê nivîskarê pêgîr, gotara vegêr û karakteran dike objeya gotara xwe ya serdest û derfeta tu xweseriyekê ji wan re nahêle. Ev jî ji aliyê deng ve monolojîkbûna vegêranê encam dide û rê li ber diyalojîzmê digire. Loma jî di nav pênc fonksiyonên vegêr ên mîna çirokkirin, binyaddanan, hevragihandin, selmandin û îdeolojîkbûnê de (Genette, 2005: 128-129) di vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê de fonksiyona îdeolojîk a vegêr bi xurtî derdikeve pêş û ev jî rê li ber wê yekê vedike ku di vegêrana vê edebiyatê de zûrbûneke sabît (fixed focalization) û dengê vekirî yê îdeolojîk (Jahn, 2012: 63-64) zal bin û hemû rûdan û karakterên deqên edebî di çarçoveya cihanbîniyêke diyarkirî de bèn şîrovekirin.

2. Cih

Mîna vegêr û vegêranê ji aliyê cih ve jî di berhemên edebiyata kurdî ya Sovyetê de hevbeşiyên berbiçav hene. Cihên ku di van berhemên de tên behskirin çavkaniya xwe ji jiyana rasteqîne ya kurdên Sovyetê û rêbaza realîzma sosyalîst werdigirin û derencama rastiya wan a civakî û îdeolojîk in. Ji ber vê cihên ku di van berhemên de derbas dibin bi giştî gund in û piraniya rûdanan li gundan diqewimin. Carinan behsa bajarên mîna Qers, Erîvan, Tiflîs, Moskova û Lenîngradê bê kirin jî ji bilî çend îstîsnayan ev bajar nabin navenda qewimîna rûdanan. Karakter ji bo xebat, serdan yan jî xwendinê biçin van bajarên jî dîsa vedigerin gundê xwe. Ji ber vê, mirov dikare bibêje ku edebiyata kurdî ya Sovyetê edebiyateke gundewar e û ji bo hin mebestên diyarkirî jiyana gundewarî îdealîze dike.

Gund di rûdanên berî Şoreşa Bolşevîk de cihê hikumraniya axa û began in. Ji ber zordariya axa, beg û Romê, karakterên edebî ji gundên xwe ber bi Rûsyayê koç dikin. Di gundên nû de aramî û seqamgîriyêke nîsbî çê bibe jî piştî têkçûna monarşîzma rûsî û êrîşa Romê careke din rev û koç dest pê dike û gund tên valakirin. Bi vî awayî berî Şoreşa Bolşevîk gund wek cihên zordariya sîstema feodal û zordestiya Romê tên nîşandan û di encamê de jî tên kavilkirin. Berevajî vê, gundên piştî Şoreşa Bolşevîk laboratuvarên bicihkirina bernameya damezirandinê ya sosyalîst in û navendên wekhevî, pêşketin û modernkirinê ne. Li hember kavilkariya berê di van gundan de kolxoz, xwendingeh, dîspanser û sêwîxane tên vekirin, zarok dest bi xwendinê dikin, jin û mêr di kolxozan de dixebitin û ciwan piştî ku li bajarên mezin xwendina xwe temam dikin ji bo bicihkirina bernameya damezirandinê û pêşketina civaka xwe vedigerin gundan.

Di *Jiyana Bextewar* de rûdanên pêşî yê romanê li dor kesayeta Emerîk li gundê Dêrikê diqewimin. Eşîreta Sîpkan piştî ku ji ber zordariya Silêman Beg û baca Romê koç dikin li Rûsyayê li gundê Hesencano bi cih dibin. Emerîk zivistanê diçe Tiflîsê kar dike û havînê jî tê gund karê çandiniyê dike. Dema Rom êrîşî wan dike endamên malbata Emerîk diçin gundê Axbaranê û çend roj paşê ew gund jî dikeve ber êrîşa Romê û ji wir jî direvin. Piştî Şoreşê Sehîdê kurê Emerîk li Lenîngradê dest bi xwendina bilind dike, di 1932yan de xwendina xwe temam

dike û berê xwe dide gundê xwe. Tevî ku Sehîd dikare biçê enstîtuyên mezin jî bi zanebûn gundê xwe tercîh dike û ji gundiyên xwe re diyar dike ku dê li cem wan bixebite (r. 235). Ji ber vê, dema wek rêvebirê mekteba gundê Sengerê dest bi kar dike li mektebê dera jinan dide û di çarçoveya xebatên kolxozê de jî hêz dide bingeha aborî ya gundê xwe (r. 238).

Di Hewarîya Heciyê Cindî de rûdanên berî Şoreşê li gundê Camûşvanê diqewimin. Fêrîkê kurê Egîdê Axa zivistanan li bajar dixwîne û havînan tê gund û hizrên şoreşgêriyê belav dike. Herwek gundên romana *Jiyana Bextewar* ev gund jî dikeve ber êrîşa Romê û tê kavilkirin. Lê piştî Şoreşê rewş diguhere û gund tên avadankirin. Nûrêya xwişka Fêrîk li gundê Kûrekendê di sêwîxaneyê de dixebite û ev gund bi elektirîk, radyo, rojname, kolxoz û çandiniya xwe gundekî avadan, şên û pêşketî ye.

Di romana *Kurdê Rêwî* ya Sehîdê Îbo de rûdan li gundê Qereqoyînê diqewimin. Ev gund cihê hikumraniya Hemîd Beg e, loma jî kesên ku li dijî desthilata wî derkevin tên talankirin û ji gund tên derxistin. Mîna hemû gundên berî Şoreşê di dawîya romanê de gundê Qereqoyînê jî dikeve ber êrîşa Romê û gundî xwe li Sovyetê digirin. Ev roman ji ber ku nehatiye temamkirin û wek berga yekem maye tê de behsa gundên piştî Şoreşa Bolşevîk nehatiye kirin, lê diyar e, eger berga duyem bihata nivîsîn mîna romanên din di vê romanê de jî em dê rastî gundên avadan û pêşketî bihatana û ev jî dê bi hebûna Sovyetê ve bihatana girêdan.

Morof a Eliyê Evdilrehman jî mîna *Kurdê Rêwî* rûdanên berî Şoreşê vedigire û rûdanên vê berhemê pêşî li gundê Xalit Beg, paşê jî li gundê Selîm Beg diqewimin. Di her du gundan de jî her tişt di destê began de ye û tu qîmeta kesên belengaz nîne. Di gundê Xalit Beg de Geliyê Qetlê cihê kuştina mirovên belengaz e û di gundê Selîm Beg de jî dîwan cihê hikumraniya began e li hember hejaran. Ji ber vê di destpêka berhemê de ji ber êşkenceya zilamên Xalit Beg, Morof ji gundê wî direve û di dawîya çîrokê de jî Morof, Memo û hevalên wan wek nûnerên çîna hejar; ji gundê Selîm Beg direvin û xwe li welatê Sovyetê digirin.

Di *Dê û Dêmarîya* Egîdê Xudo de navenda rûdanan gundê Mêrgesorê ye û wek gundekî piştî Şoreşê tê de kolxoz, mekteb, sêwîxane û dispanser hene. Karêya karaktera sereke ya romanê wek nûnerê sîstema sosyalîst piştî temamkirina xwendina xwe di sêwîxaneyê de dixebite û zarokên sêwî yên “Şerê Wetenî”yê perwerde dike. Ji bilî wê di gund de rêvebirên sêwîxaneyê, mamosta, karmendên tenduristiyê jî kar dikin û wek nûnerên sîstema Sovyetê xizmeta gundiyan dikin.

Di *Xezala Sîma* Semendê de jî piraniya rûdanan li gundê Elegezê diqewimin. Wek karaktera sereke ya çîrokê Xezal heta pola dehan xwendina xwe ya pêşî li vî gundî temam dike û paşê ji bo xwendina tibê diçe Erîvanê. Piştî ku şeş sal li wir dixwîne tevî Ahmoyê dergistiyê xwe berê xwe didin gundên xwe. Xezal

li gundê Elegezê û Ahmo jî li gundê Artaşatê dest bi doktoriyê dikin û bi kêfxweşî xizmeta gundiyên xwe dikin.

Di çarçoveya van mînanan de ji bo me ron dibe ku cihên ku di edebiyata kurdî ya Sovyetê de tînan behskirin ne cihên vêkxistî û xeyalî ne, belkî deravêtêya jiyana rasteqîne ya kurdên êzîdî ne û rasterast çavkaniya xwe ji rastiya civakî û îdeolojîk werdigirin. Ji ber vê di berhemên navborî de wek taybetmendiyê hevbeş a vegêranê gundên kavlî ên berî Şoreşê û gundên avadan û pêşketî yê piştî Şoreşê tînan berawirdkirin û di çarçoveya bicihkirina bernameya damezirandinê de keç û xort piştî temamkirina xwendina xwe ji bajaran vedigerin gundan û di pêşvebirin û xizmetkirina gundên xwe de bi awayekî çalak cih digirin. Ji ber vê, cih jî mîna hemû taybetmendiyan din ên vegêranê di edebiyata kurdî ya Sovyetê de xwedî karaktereke îdeolojîk e û bi vê rola xwe di berhemên edebî de tê temsîlkirin.

3. Karakter

Tomaşevski wek teorîsyenekî formalîzma rûsî, di mijara afirandina karakterên edebî de behsa karakterên neguher û karakterên guherbar dike. Li gor wî, karakterên neguher di maweya fabulayê de naguherin û di serî de çawa bin di dawiyê de jî wek xwe dimînin, lê karakterên guherbar bi pêşveçûna çalakiyan re diguherin û di maweya rûdanê de taybetiyên ciyawaz hildigirin (Tomaşevski, 275). Forster jî bi zaravên ciyawaz behsa heman tiştî dike. Li gor wî karakterên romanên yan yekalî (flat) yan jî gilover (round) in. Karakterên yekalî xwedî yek taybetî û yek hizrî ne û ji ber vê çendê jî hertim di bin kontrola nivîskar de ne, li hember vê karakterên gilover xwedî gelek taybetiyan in (Forster, 2001: 108-109), di çarçoveya hizrekê de nayên pênasekirin û ji nivîskar cudatir xwedî hizr û cihanbîniya xwe ya taybet in.

Afirandina karakterên edebî di rêbaza realîzma sosyalîst de di çarçoveya tîpên erênî û nerênî de derdikeve pêş ku tîpên erênî bi mebesta bicihkirina bernameya damezirandinê ya sosyalîst tînan îdealîzekirin û tîpên nerênî jî wek berdevkên cîhana feodal yan jî kapîtalîst tînan reşkirin. Lunaçarski wek pêşengekî realîzma sosyalîst, diyar dike ku karakterên edebiyata Sovyetê divê biryardar bin û bi roleke siyasî, civakî û rewîştî beşdarî bicihkirina bernameya damezirandinê bibin (Lunaçarski, 2000: 13), Jdanov jî geşbînî, şewq û qehremaniyê ji bo karakterên edebiyata Sovyetê pêwîst dizane û ji nivîskaran dixwaze ku karakterên xwe ji karker, kolxozvan, endamên Partiyê, rêvebir, endazyar û komsomolan hilibijêrin (Jdanov, 1996: 17). Ji ber ku nivîskarên edebiyata kurdî ya Sovyetê di afirandina karakteran de xwe dispêrin hizrên van pêşengên realîzma sosyalîst karakterên vê edebiyatê gelek dişibin hev û taybetiyên karakterên neguher û yekalî hildigirin. Ev karakter li gor rola xwe ya erênî yan jî nerênî di serî de çawa bin di dawiyê de jî wek xwe dimînin û di nav qalibên temsîliyeta îdeolojîk de tevdigerin. Ji ber vê jî di vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê de axa, beg, Romê û Daşnak hertim wek karakterên xirab û tîkder tînan nimandin, lê şivan,

rençber, rûs, ermen, komsomol (komunîstên ciwan), endazyar, kolxozvan û berpirsyarên Partiya Komunîst wek kesên erênî û xebathez tên îdealfizekirin.

Di *Jiyana Bextewar* de di nav gelek tîpên nerênî de pêşî behsa Silêman Beg tê kirin. Silêman Beg zîlamê hikumeta Romê ye, xerc û bacê nade hikumetê û di ser de mehê du zêran ji hikumetê werdigire. Ji bilî vê xwe dike şîrkê mal û qelenê xelkê û bi zorê dest datîne ser keda wan (r. 26). Dema li ser daxwaza milazimê Romê baceke giran dide ser gundiyan, di beramberî bîst zêran de nivê bacê tîne xwarê û bertîlê dixwe. Ji bilî vê dema digel rayedarên Romê di mala Emerîk de nan dixwin doza “dîş kîrasîyê” (kirêya diranan) lê dike û pênc zêran ji bo milazim, sisêyan ji bo qaymeqam û sisêyên din jî ji bo xwe ji Emerîk werdigire. Tevî ku çend jinên Silêman Beg hene jî çavê wî di Xezala keça Emerîk de ye û ji aliyê rewîştî ve jî mirovekî xirab e.

Mistefa Beg jî wek Silêman Beg mirovekî zordar e. Ji ber ku kulavekî nade Îbrahîmê şivanê xwe zivistanê Îbrahîm li ber pez ji serma nexweş dikeve û piştî çend mehan dimire (r. 89). Li ser vê Mistefa Beg dest datîne ser kavirên Îbrahîm û heqê wî yê salê jî nade malbata wî (r. 92). Piştî çend salan dema Mihemedê kurê Îbrahîm û Îsmailê kurê Mistefa Beg ji bo lîstikê pev diçin Mistefa Beg bi daran li Mihemed dixê û wî dîkujê. Dema komsêrê dewletê ji bo vê rûdanê tê gund jî Mistefa Beg wî di mala xwe de ziyafet dike û bê ku cezayekê wergire ji ber hevkarîya hikumetê ji cezakirinê rizgar dibe.

Di romanê de Milazim karaktera nerênî ya Romê dinimîne. Dema tê gund tevî Selîm Beg dibe mêvanê Emerîk. Wek nîşaneyê serdestiya Romê gava Emerîk wek xwediyê malê xêrhatinê lê dike Milazim qet paxava wî nake û silava wî jî ranagire (r. 24). Emerîk ji ber ku taybetiyên eskerên Romê dizane ji gundê ermenyan jê re şerab û eraqê tîne, lê Milazim li hember dostaniya kurd û ermenyan dilgiran dibe û nerazîbûna xwe nîşan dide (r. 26). Herweha wek nîşaneyê bêrewîştîya wî di mala Emerîk de ew jî mîna Silêman Beg çav berdide Xezala keça wî û ji ber ku nanê wî xwariye “dîş kîrasîyê” (kirêya diranan) ji Emerîk werdigire.

Li hember van tîpên nerênî rûs û ermen wek tîpên erênî tîne nimandin. Emerîk û birayên xwe li hember xirabkarîya Romê behsa qenciya rûsan dikin û diyar dikin ku berî çend salan eskerên rûs tîne welatê wan, lê tu zulmeke weha li kurdan nakin (r. 37), heta dema şîr jî ji malan dibin heqê gundiyan didin. Mîna rûsan ermenî jî hertim dost û xêrxwazên kurdan in. Kîrakosê ermenî ji bo derbasbûna Rûsyayê rêbertiya eşîreta Sîpkan dike û ermenên Gola Sevanê jî bi germî pêşwazî li malbata Emerîk dikin.

Tîpên erênî wek nûnerên sosyalîzma Sovyetê bêtir di pêvajoya Şoreşa Bolşevîk de û piştî Şoreşê derdikevin pêş. Di romanê de berî Şoreşê Misto li Sarîqamîşê dibe endamê Partiya Bolşevîk, derbarê partiyê de gelek kitêb dixwîne û bi arîkarîya hevalên xwe yê ermenî Gêgam Hakobyan û Sûrên Hovsêpyan di nav xelkê de propagandaya Şoreşê dike (r. 106). Piştî Şoreşê Misto di çarçoveya

bicîhkirina bernameya damezirandinê de li ser elîfbayeke kurdî dixebite û dixwaze bi saya Sovyetê elîfbayeke latînî ji bo kurdan çê bike. Herweha ji bo amadekirina kadroyên pêşketî di nav kurdan de wek endamê Komîteya Merkezî ya Partîya Bolşevîk a Ermenîstanê di 1927an de diçe li Moskovayê Stalîn dibîne û di heman salê de ji bo perwerdekirina xortên kurd “Texnîkûma Pêdagogîyê” tê vekirin (r. 221).

Mînaka herî berbiçav a tîpên erênî di romanê de Sehîd e. Di pêvajoya Şoreşê de dema li Tîblîsê digel Emerîkê bavê xwe dimîne rûbirûyê adetên berê dibe. Hizra heramkirina xwendinê ya şêxên êzîdî wek gotineke derew dide zanîn (r. 207) û piştî serkeftina Şoreşê dest bi xwendinê dike. Dema xwendina xwe tamam dike ji bo bicîhanîna erka bernameya damezirandinê vedigere gundê xwe. Li gund ji aliyekî ve zarokan perwerde dike, ji aliyê din ve jî di nav xebatkarên gund de hişmendiya komunîstiyê belav dike. Ji bilî karê xwe yê eslî, di nav kolxozê de jî kar dike, jinan li xwendingehê dicivîne, ders dide wan û bi saya wî di nav mehekê de li gund pêşketineke berbiçav çê dibe. Di encama vê hişyariyê de jî dema gundiyên wî bi kolxozê gundê Camûşvana Biçûk re dikevin “Ica sosyalîstiyê” (r. 238) bi ser dikevin û pêşketinxwazî û serkeftina sîstema Sovyetê diselmînin. Sehîd di pêvajoya Şerê Weteniyê de jî wek kesekî nimûneyî derdikeve pêş. Di sala 1941ê de dema Partîya Komunîst a Ermenîstanê wî ji bo xwendinê dişîne Moskovayê Hîtler êrîşî Sovyetê dike û ew jî digel xortên komunîst diçe eniya şer. Ji ber serkeftina wî wek albay ji bo Bêlorûsyayê tê şandin û di dawiyê de bi madalyaya qehremaniyê tê xelatkirin (r. 279).

Di *Hewariyê* de jî beg, axa û rom wek tîpên nerênî derdikevin pêş. Di para yekem a romanê de li ser zimanê Moskov û Şêweş çendîn çîrok û serpêhatiyên zordariya van karakteran tê veguhestin. Di van hemû mînakên de jî ev karakter zordar, bertilxwar û fitnekar in (r. 155). Li hember wan rûs û ermen wek mirovên baş û xêrxwaz arîkariya kurdên êzîdî dikin. Dema nûnerên dewleta Romê di nav kurdên musulman û kurdên êzîdî duberekiyê çê dikin (r. 88) rûs wan yek millet dibînin (r. 100) û kêşeyên wan ên navxweyî bi dadperwerî çareser dikin. Ji ber vê jî rayedarên Rûsyayê di rûdana revandina Gulîzerê û kuştina xwişka wê de Egîdê Axa bi mişextiya Sîbîryayê ceza dikin û nahêlin di navbera eşîreta Sîpkan û Hesenan de şer biqewime. Herweha dema kurdên êzîdî ji ber Romê direvin ermenî arîkariya wan dikin û deriyê xwe ji wan re vedikin (r. 173).

Bêguman di *Hewariyê* de tîpê erênî yê sereke Fêrîk e. Di destpêka romanê de li ser zimanê Babayan, Fêrîk wek şoreşgêrekî berbiçav ê devera Sîbîryayê tê nasandin ku “Hukimeta Sovêtê bi sîngê xwe xweyî kiriye” (r. 30) û ji ber vê qehremanîya wî li ser zimanê Nûrêya xwişka wî jî Fêrîk wek birayê tevahiya cemaetê tê ragihandin (r. 32). Lewra Fêrîk dema li Sîbîryayê dixwîne beşdarî komên şoreşgêr dibe û havînan jî li gund hizrên şoreşgêriyê belav dike. Pirtûkên Belînskî, Çernîşevskî, Dobrolyûbov û Gorkî dixwîne û helbest û nivîsên xwe di kovar û rojnameyan de belav dike (r. 361). Di romanê de Fêrîk wek tîpekî erênî çavê hevalên wî de wek “teyrê atmece” û di çavê xelkê de jî wek kesekî “xweyî

dil û cegerê pola” tê nasandin (r. 363). Gava bi hevalên xwe yên kurd, ermen û rûs re bi sê zimanan derbarê Şoreşê de diaxive hemû jî di bin karîgeriya gotinên wî de dimînin (r. 364). Ji ber vê gava Romê êrîşî gundê Camûşvanê dike nameyeke Fêrîk bi destê wan dikeve ku di vê nameyê de Fêrîk wek şoreşgêrekî stratejîst rê dide ber hevalên xwe û mizgîniya serketina Şoreşa Bolşevîk dide wan li Ermenistanê. Bi vî awayî Heciyê Cindî di romana xwe de di karaktera Fêrîk de ruhê Şoreşa Bolşevîk berceste dike û Fêrîk wek karakterê nimûyî yê serdema Sovyetê derdixe pêş.

Di romana *Kurdê Rêwî* de Hemîd Beg, Ahmed, Keleşê Rîspî, Serdar, Pîr Mîrzo û Zînê karakterên nerênî ne û her yek ji wan bi aliyekî xwe yê xirabkar di romanê de roleke têkderane digêre. Di nav wan de Hemîd Beg karakterê sereke yê nerênî ye. Wek begê êla Hesenîyan bi zordestiya xwe navdar e. Dest datîne ser keda Eliyê şivan û Keremê kurê wî bê heq dide xebitandin (Îbo, 2009: 5-7), bi rêya Ahmedê kurê xwe û Serdar mala Zurbe û Şiblî bi cerdeyan dide talankirin (r. 18) û wan ji gund dide derxistin. Pîr Mîrzo di romanê de kesê duyem ê nerênî ye, zilamê Hemîd Beg e û di bin xizmeta wî de ye (r. 2). Hemû mal û milkên wî keda xelkê ye. Herçend xwe wek dostê gundiyan nîşan bide û di malên wan de bixwe û vexwe jî durûtî dike û ji bo berjewendiyên Hemîd Beg kar dike (r. 12). Zîna keça Pîr Mîrzo jî bi fitnekariya xwe evîna Kerem û Zeytûnê têk dide û ji ber vê çendê dibe sedem ku Hemîd Beg Kerem biqewirîne û keça xwe bide Serdarê kurê Keleş (r. 13,21). Herweha Zînê di romanê de ji ber hekîmiya xwe ya derewîn dibe sedema mirina zarokan (r. 40). Keleşê rîspî di nav tîpên nerênî de bêtir bi çikûsiya xwe tê nasandin (r. 3). Ji ber qelen naxwaze kurê xwe bizewicîne. Serdarê kurê wî jî ji bo ku Zurbe ji gundiyan bê veqetandin li ser daxwaza Hemîd Beg bi Meyaneya keça Zurbe re dizewice û ji xezûrê xwe dixwaze ku rûneda gundiyan. Dema Zurbe guhdariya wî nake li ser daxwaza Hemîd Beg Meyaneyê berdide (r. 9) û li cem Sebriyê kurê xwe Meyaneya dêya wî biçûk dixwe (r. 15). Karapêt Axa jî wek Hemîd Beg axayekî zordar e, ji tevgerên Sûrên nerazî ye û peywendiya wî bi kurdan re baş nabîne (r. 22). Li ser daxwaza Hemîd Beg Zurbe ji gundê xwe derdixe (r. 37) û dema Sûrên gundiyan li dijî wî han dide giliya wî bi hikumetê dike û li dijî bereya şoreşgêr radiweste.

Zurbe, Hemze, Şiblî, Sûrên, Ûmnov, Mêrûjan, Kerem, Ûsiv û Sebrî di romanê de li hember bereya feodal a xirabkar wek tîpên erênî bereya şoreşgêr pêk tînin. Zurbe bi keda xwe dibe xwedî mal û milk, lê berevajî Hemîd Beg dostaniya gundiyan dike û arîkarî dide wan. Ji ber ku peywendiya xwe bi gundiyan re nabire li ser daxwaza Hemîd Beg mala wî tê talankirin (r. 9). Sûrênê ermenî dostê Zurbe ye dema mala Zurbe tê talankirin arîkarî didiyê û wî dibe gundê ermenîyan, jê re behsa hizrên şoreşgêriyê dike û wî dike nav bereya şoreşgêr (r. 11,16). Ûmnov karakterekî rûs e û nûnerê herî bihêz ê Şoreşa Bolşevîk e di romanê de, tevî Sûrênê ermenî di nav xelkê de digerin û hizrên şoreşgêriyê belav dikin (r. 33). Gava artêşa Romê êrîş dike Ûmnov bi nameyekê hevalên xwe hişyar dike da ku xelkê wê deverê ber bi axa Sovyetê ve bi rê bikin. Kerem kurê Eliyê şivan e, dema bavê wî dimire şivantiya Hemîd Beg dike. Ji ber zordariya

Hemîd Beg hevaltiya Zurbe û kesên din ên şoreşgêr dike. Ji ber ku evîndarê keça Hemîd Beg e rastî gelek zehmetiyan tê û di dawiyê de tê kuştin. Sebrî kurê Serdar û Meyaneyê ye, lê tu carî ji bavê xwe hez nake û li dijî wan hevaltiya Zurbe dike. Gava Serdarê bavê wî û Ahmedê kurê Hemîd Beg, Kerem dikujin ew jî Ahmed dike û Serdar bi zorê xwe ji destê wî rizgar dike (r. 57). Hemze xortekî rênçber e, ji aliyê Sûrênê ermenî û çend hevalên wî ve tê hişyarkirin û ji ber belavkirina hizrên şoreşê bi giliya Hemîd Beg tê girtin (r. 15). Şiblî birayê Hemze ye, li ser daxwaza Hemîd Beg cerde davêjin ser mala wî (r. 18) û dema birayê wî di zindanê de di bin metirsiya kuştinê de ye bi arîkariya Mêrûjanê ermenî wî ji zindanê direvîne (r. 53). Ûsiv biraziyê Şiblî ye û kesekî xwenda ye, di şevbihûrkekê de gava behsa serkeftina şoreşa pale û gundiyan rûs dike Hemîd Beg û Pîr Mîrzo jê aciz dibin (r. 34), li dijî tedawiya bi nivîşt û duayên derewîn ên Zînê gundiyan hişyar dike û Zînê wek şarlatenekê dide nasîn (r. 40).

Di Morofa Eliyê Evdilrehman de Xalit Beg nûnertiya begên zordar dike. Ji ber ku lingê bilindireke wî dişike Morofê şivanê xwe dide kutanê û wî davêje Geliyê Qetlê da ku li wir bimire. Dema termê Morof li wir nabîne li pale û şivanên xwe hêrs dibe û wan jî dide kutanê. Di çîrokê de piştî Xalit Beg wek karakterekî nerênî behsa Selîm Beg tê kirin. Tevî ku Selîm Beg tu zilmekê li Morof nake û wî dike dengbêjê xwe jî di çavê Morof de ew jî mîna begên din kesekî xirab e û keda mirovên hejar dixwe (Evdilrehman, 2012: 48). Li hember van karakteran; Morof, Memo û Etar Zindî nûnertiya bereya şoreşgêr dikin. Morof wek şivanekî hejar dibe mexdûrê zordestiya Xalit Beg û bi arîkariya Şemo ji kuştinê rizgar dibe. Tevî ciwanî û nexwendatiya xwe jî wek bîrmenekî şoreşgêr tê îdealîzekirin. Morof ne di jiyane de ne jî di mirinê de wekheviya xizan û dewlemendan nabîne (r. 11) û di vê rewşê de bawer nake Xwedayekî dadperwer hebe (r. 31). Dema ji neçarî dengbêjiya Selîm Beg dipejirîne, qayîl nabe ku bi kilamên xwe pesnê wî bide (r. 44) û di dîwana wî de bi dizî bangeşeya serhildana pale û gundiyan rûs dike. Ji ber vê jî dema bi Selîm Beg re diçe nav êla Hesên Beg û kilaman dibêje gundî û hejarên wir ji ber bedewî û aqilê wî Morof hêjayî pêşengtiya çîna hejar dibînin (r. 56). Memo jî herwek Morof karakterekî erênî ye, deriyê mala xwe ji Morof re vedike û wî di mala xwe de derman dike. Ji şoreşa pale û gundiyan rûs agahdar e û vê rûdanê bi girîngî dişopîne. Memo hîn di ciwaniya xwe de rûbirûyê began bûye û ji ber ku dest avêtiye Gulîstana nîşaniya wî Egîf Beg û du kurên wî kuştine. Di nav mala xwe de qaydeyên şewra sosyalîstiyê peyrew dike (r. 46). Ji ber vê di zewaca Morof û Nûrêya keça xwe de razîbûna her du aliyan werdigire û stendina qelen jî bêexlaqiya dewlemendan dide zanîn (r. 53). Etar Zindî jî wek tîpekî erênî di nav êla Hesên Begê Zazî de bi dizî teşkîlata komünîst çê dike û dostê Memo ye. Dema Morof diçe nav êla wan bi gotina şîfreyî ya “mirî gelek in, yan zindî” hev dînasin û Etar derbarê Şoreşa Bolşevîk de agahî didiyê.

Di Dê û Dêmariya Egîdê Xudo de ji ber ku behsa rûdanên piştî Şoreşê tê kirin rola kesayetên nerênî lawaz e, wek kesayetê nerênî behsa Hîtler û di mijara zewaca Sîsê û Saşa de jî behsa rola xirab a Şêx Sefo bê kirin jî bêtir tîpên erênî tên berçavkirin. Di romanê de di nav gelek tîpên erênî yê mîna Evdokya, Evêlîna

Rubênovna, Badalyan, Reşîd, Tosin, Sîsê, Saşa û Ûsiv de tîpa erênî ya sereke Karê ye û herî zêde ew tê berçavkirin. Karê keçeke jîr û zana ye, tevî ku gelek ciwan e jî dema Evdokya kurê xwe yê biçûk di mala wê de dihêle û beşdarî şer dibe, bê ku guhê xwe bide gotegotên xelkê Saşa mezin dike û jê re dayîktî dike. Dema Cemalê dergistiyê wî di şer de dimire wek nîşaneyê wefadariyê naxwaze bi tu kesekî din re bizewice (r. 20), lê gava di bin guvaşa dost û hevalên xwe de bi Ûsiv re jî dizewice, diyar dike ku dê tu carî Cemal ji bîr neke (r. 36). Piştî mirina Ûsiv Karê wek tîpeke erênî tu carî ji têkoşîna jiyane sist nabe, Saşa mezin dike û digel hemû astengiyên wî bi Sîsê re dizewicîne.

Di Xezala Sîma Semendê de Qaçax, bavê Karê, Şêx Werda û Surmê karakterên nerênî ne. Qaçax di kolxozê gund de dixebite, lê kesekî teral e û karê xwe bi başî pêk nayîne. Dilê wî di Xezalê de heye û ji hevalê xwe re diyar dike ku eger Xezal wî nestîne dê wê birevîne. Bavê Karê wek nûnerên hizra berî Şoreşê nahêle piştî pola dehan keça wî bixwîne û Karê bi zorê dide mêran. Şêx Werda ji ber rola xwe ya dînî hekîmtiya zarokan dike, dema Xezal wek doktor tê gund û dest bi dermankirina modern dike nifiran lê dike û vê wek dijayetiya adetên bav û kalan dibîne. Surmê jî ji ber ku Mecîdê bavê Xezalê qelenê keça xwe naxwaze rexne lê digire û wergirtina qelen wek rûmeta keçan dide zanîn. Li hember van karakterên nerênî di çîrokê de behsa gelek karakterên erênî tê kirin, lê karaktera erênî ya nimûneyî Xezal e. Xezal hem dixwîne hem karê malê dike û hem jî di karê kolxozê de digel Karêya hevala xwe ji her kesî bêtir dixebite (r. 7). Serê sibehan zû radibe, berî ku biçê ser kar ji bo azmûna doktoriyê xwe amade dike (r. 10) û bi ser dikeve. Dema li zanîngehê dixwîne dibe endamê civata komsomolan û wek katiba teşkilatê tê hilbijartin. Li zanîngehê arîkariya hevalên xwe dike û ji bo têgihandina wan arîkarî dide wan. Herweha dema havînan tê gund digel hevalên xwe di kolxozê de dixebite û betal nasekine. Dema dibe doktor vedigere gundê xwe û di hefteya pêşîn de Erfûtê kurê mala Hemîd ji destê Şêx Werdayê rizgar dike û kurik baş dike. Ji ber vê jêhatîbûna xwe di şûna Qaçaxê teral de bi Ahmoyê hevalê xwe yê zanîngehê re dizewice ku ew jî mîna wê doktorekî jêhatî ye.

Ji van nimûneyan jî diyar dibe ku nivîskarên kurd ên Sovyetê di afirandina karakterên edebî de xwe dispêrin rêbaza realîzma sosyalîst û karakterên hevşewê diafirînin. Ji ber vê karakterên nerênî yên mîna axa, beg û rom hertim wek mirovên zordar û xirab tînan berçavkirin ku tu aliyekî wan ê erênî nîne, lê karakterên mîr ên mîna Sehîd, Fêrîk û Morof wek mirovên jîr, jêhatî, lihevhatî, şoreşgêr û karakterên jin ên mîna Xezal û Karê jî wek kesayetên rind, xebatêz, xwenda û hişyar tînan nîşandan ku ji hemû kêmasiyan bêrî ne û nûnerên nimûneyî yên jiyana nû ya Sovyetê ne. Ev îdealîzasyon û afirandina karakterên reşûspî di çarçoveya daxwaza avakirina serdemeke zêrîn de bi gotina Frye di nav roman û vegêrana hevçerx de ruhê romansê vedijînin ku romanên hevçerx û şoreşgêr ên Sovyetê mînakên berbiçav ên vê yekê ne (Frye, 2015: 220). Ji vî aliyê ve romanên edebiyata kurdî ya Sovyetê bêtir dişibin romansên serdema navîn û taybetmendiyên vê cureya dêrîn hildigirin.

Li aliyê din edebiyata kurdî ya Sovyetê ji ber ku di çarçoveya rêbaza realîzma sosyalîst de xwe dispêre teoriyeye mîmetîk karakterên wê yê edebî wek rengvedana mirovên rasteqîne tîn afirandin. Ji ber vê di berhemên vê edebiyatê de hin karakterên edebî rasterast bi nav û taybetiyên xwe ji jiyana rasteqîne hatine wergirtin. Di romana *Hewariyê* de Fêrik, Egîtê bavê wî, Eliyê mamê wî û Nûrêya xwişka wî kesên weha ne. Ji bilî vê, hin karakter di bin navên ciyawaz de taybetiyên nivîskarên xwe hildigirin. Di *Jiyana Bextewar* de Misto, di *Hewariyê* de Kamilê vegêrê para yekem a romanê û Xezala Sîma Semendê kesên weha ne. Hin karakter jî rasterast amaje bi kesekî diyarkirî nekin jî nûnerên tîpîk ên çînen civakî ne ku tu carî xwendevan di naskirina wan de nakevin tengasiyê. Ji ber vê ev karakter beşek ji cîhana vêkxistî bîn jimartin jî bi paradîgmaya civakî, siyasî û rewîştî ya sosyalîzma Sovyetê ve girêdayî ne û rengvedana îdeolojî û civaka Sovyetê ne.

Encam

Diyar e, nivîskarên edebiyata kurdî ya Sovyetê ji ber nebûna nerîteke nivîskî û paşxaneyeye bihêz a edebî dema bi saya Sovyetê dest bi nivîsîna cureyên nû yê edebî dikin bi awayekî siruştî hin taybetmendiyên çîrokbêjiya gelêrî tevî vegêrana xwe dikin û taybetmendiyên çanda zarekî û nivîskî têkelî hev dikin. Ji ber vê di mînaka *Jiyana Bextewar* a Erebe Şemo, *Hewariya Heciyê Cindî* û *Kurdê Rêwîya Sehîdê Îbo* de nivîskar xwe dikin şûna çîrokbêj û gotin û nivîsînê bi hev ve girêdidin. Di hemû berhemên navborî de tercîhkirina vegêrê xwedayî jî dîsa ji ber vê yekê ye ku ev vegêr wek çîrokbêj bi çavekî derekî rûdanan ji bo xwendevanan vediguhêze û dema pêwîst bike bi şîroveyên xwe tevî vegêranê dibe. Ev vegêrê baladest ji bilî ku ji aliyê gotara xwe ve nêzî çîrokbêj e, di heman demê de ji ber taybetmendiyên xwe yê vegêranê jî bi kêrî nivîskarê pêgir tê û bi gotara xwe ya serdest xwendevanan li gor armancên xwe yê îdeolojîk araste dike. Li aliyê din pêgiriya îdeolojîk a nivîskaran dibe sedem ku gotara nivîskar, vegêr û karakteran hevgiirtî be û vegêraneke monolojîk derkeve holê.

Vegêrana folklorîk û monolojîk a edebiyata kurdî ya Sovyetê ji aliyê cih ve jî hevbeşiyekê bi xwe re tîne û di berhemên vê edebiyatê de wek cih tercîhkirina gundan bi vê cure vegêranê re di nav hevgiirtinekê de ye. Lewra gund jîngeha siruştî ya vegêrana folklorîk û monolojîk in û bi nîsbet bajaran di nav xwe de homojenîteyekê dihewînin. Ji ber vê çî berî Şoreşê çî jî piştî Şoreşê be di mînaka berhemên navborî de di piraniya berhemên edebiyata kurdî ya Sovyetê de rûdanên sereke li gundan diqewimin û gund di navenda vegêranê de cih digirin. Ji aliyê din ve gund ji bo bercestekirina armancên îdeolojîk ên Sovyetê ji ber sadebûn, paşdemayîn û rewşa xwe ya çînî ji bo bicîhkirina bernamaya damezirandinê ya sosyalîst cihên guncaw in. Ji ber vê, nivîskarên kurd ji aliyê rewşa civakî, siyasî û pêşketinên aborî ve gundên berî şoreşê û piştî şoreşê berawird dikin û karakterên xwenda yê hişyar ji bajaran vedigerînin bo gundan da ku civakeke nimûneyî ya sosyalîst damezirînin.

Bêguman hevbeşiya vegêranê û cih di çarçoveya rêbazeke diyarkirî de dibe sedem ku di afirandina karakterên edebî de jî hevbeşî û homojeniyekê derkeve holê. Lewra karakterên ku di jîngeheke hevbeş a îdeolojîk û gundewar de tên temsîlkirin bi yekalîti û nûnertiya xwe ya çîni tên afirandin û tu carî ji rola xwe ya destnîşankirî dernakevin. Ev jî rê li ber wê yekê vedike ku di vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê de karakterên yekalî û neguher bînan afirandin û ji bilî temsîliyeta wan a civakî, siyasî û îdeolojîk tu xweseriyekê wan a takekesî neyê berçavkirin. Ji ber vê çendê berhemên vê edebiyatê ji kûrahiyê psîkolojîk, îmajên resen û hizrên ciyawaz ên felsefî bêpar dimînin û di hiş û dilê xwendevanên hevçerx de bi tehmsarkî tînan pêşwazîkîrin. Lewra tîpên nerênî bi nûnertiya civaka feodal a paşketî hertim xirabkarî dikin û tu aliyekî wan ê baş nîne, tîpên erênî jî bi ciwanî, xweşikî, jêhatîbûn û zanabûna xwe nûnertiya civaka sosyalîst dikin û wek kesên nimûyî yê bêkêmasî bernameya damezirandinê ya sosyalîst cihbîcîh dikin. Ev îdealîzekerî û yekalîti jî renekî romansên Serdema Navîn dide vegêrana edebiyata kurdî ya Sovyetê ku di çîrokên folklorîk ên kurdî de jî em rastî heman taybetiyên tînan.

Çavkanî

- Cindî, H. (2008). *Hewarî* (Tîpguhêzî, P. Alîmûradî). Diyarbakır: Lîs.
- Dervişcemaloğlu, B. (2014). *Anlatıbilime Giriş*. İstanbul: Dergah Yayınları.
- Evdilrehman, E. (2012). *Morof* (Tîpguhêzî, M. Têmûr-D. Têmûr). Diyarbakır: Lîs.
- Forster, E. M. (2001). *Roman Sanatı* (Wer. Ü. Aytür). İstanbul: Adam Yayınları.
- Frye, N. (2015). *Eleştirinin Anatomisi* (Wer. H. Koçak). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Genette, G. (2005). "Anlatı Türleri ve Anlatıcının İşlevleri" (j. 87, r. 127-130) *Kitaplık*. İstanbul.
- Genette, G. (2011). *Anlatının Söylemi* (Wer. F. B. Aydar). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Îbo, S. (2009). *Kurdê Rêwî* (Tîpguhêzî, X. Omerxalî). İstanbul: Avesta.
- Jahn, M. (2012). *Anlatıbilim: Anlatı Teorisi El Kitabı* (Wer. B. Dervişcemaloğlu). İstanbul: Dergah Yayınları.
- Jdanov, A. A. (1996). *Edebiyat Müzik ve Felsefe Üzerine* (Çapa Duyem) (F. Berktaş, Wer.). İstanbul: Kaynak Yayınları.
- Lunaçarski, A. (2000). *Devrim ve Sanat* (S. Kaya, Wer.). Ankara: İnter Yayınları.
- Onega, S.-Landa, J. A. G. (2002). *Anlatıbilime Giriş* (Y. Salman-D. Hakyemez, Wer.). İstanbul: Adam Yayınları.
- Semend, S. (1996). *Xezal* (Tîpguhêzî, Ş. Kaya). Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Stanzel, F. K. (1997). *Roman Biçimleri*, (Wer. F. Tepebaşılı). Konya: Çizgi Kitabevi Yayınları.
- Şemo, E. (2015). *Jiyana Bextewar*. Diyarbakır: Lîs.
- Xudo, E. (1995). *Dê û Dêmarî* (Tîpguhêzî, N. Kutlay). Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Wood, J. (2010). *Kurmanca Nasıl İşler?* (Wer. E. Bodur). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.